**Banga Alîkarîyê**

**Ji Bo Navenda Protêza**

Ji sala 2011’dan û virde pevçûnên kû di bakûr rojhilatê Sûrîde rû dane, karesatên pir giran û dijwar bi xwe re anîn. Her çi qas bi tinekirina DAÎŞ û hinek komên din yên çekdar liser erdê aramîyek di herêmêde peyda bîbejî, me tirsîya ne aramîyê jiber êrîşên derdor hîna berdewame. Vê dema derbazbûyîde di encama vî şerê hilweşînerde yek ji karesatên herî mezin û bi êş ew bû kû, bi hezaran mirov perçeyek yanjî lebatek ji canê xwe windakirin. Ev mirov jibo carekdin bi awayek tendûrist û têrker tevlî civakê bibin û pêdivîyên xwe bi awayek bê minet pêk bînin hewcedarîya wan bi arîkariyek berdewam heye. Ger rewşên xwezayî û zikmakîjî tevî yên şer were berçavgirtin, îro di bakûr û rojhilatê sûrîde derdorî 6000 mirov pêwîstîya xwe bi çêkirina protezan hene. Li gel vê yekê bi hezaran mirov pêwîstîya xwe bi fizyo terapî û alikarîya derûnî heye.

Ji bo ji nûve tevgerkirin û bi awayek aktif tevlîkirina civakê ya van mirovan, çêkirina navendeke protezan elzem bû. Ji ber kû di vîya navendek xizmetên tespîtkirin, dîzayn, hilberîn, sererastkirin û desteka psîkolojîk ji bo wan pêşkêş bi kira.

Tevî şert û mercên herêmê û zehmetiyên ku di sektora tenduristiyê de heta niha tên kişandin jî, Rêxistina Heyva Sor a Kurd navendeke pispor a lênêrîn û sererastkirinê (protêz - dermankirina fîzîkî - û desteka derûnî) li bajarê Qamişlo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dîroka 1/1/2022 vekir û tê de xizmetên xwe bê pere ji hemû beşên civakê ji hemû herêmên Sûriyeyê re pêşkêş dike.



Navend bi rêya ekîbeke bijîşkî ya pispor nexweşan pêşwazî dike. Tevî piştgiriya hinek rêxistinên hevkar jî, em rastî gelek zehmetiyan tên. Zehmetîya herî mezin dabinkirina perçe û madeyên bijîşkî yên jibo çêkirina protezan de tê kişandin. Her wiha alavên bijîşkî û werzîşê ku alîkariya tîma fizyoterapî di dermankirina nexweşan de dike

Ji ber zehmetiyên hatina nexweşan ji deverên dûr û ji ber rewşa dorpêçê ya herêmê , bi armanca gihandin û pêşkêşkirina xizmetê ji bo her kesî me şaxek din yê navenda protezan li Heleb ( şêxmaqsûd) vekir. Ev navend pêwîstîyên me yên kû me li jor destnîşan kirîn hîn zêdetir kir.

**Kurdish Red Crescent, KRC – Heyva Sor A Kurd NGO**
**Headquarters:** Kornish district – Eben Hesham street, building num. 12 Al-Qamishli – Syria
Tell: +963 52 430 700 - email: info@hskurd.org - website: www.hskurd.org




Em bang li hemû rêxistinên navcîhanî û mirovî yên têkildar û kesayetên tenduristî û civakî dikin da ku destê alîkariyê bidin me û hemû pêdiviyên pêwîst ji amûr û madeyên bijîşkî û wekî din ji me re dabîn bikin.

Ev mirovên kû wê ji van navendane sûdê wergirin piraniya wan xelkên ku di pêvajoya kirîza Suriyê û êrîşên tundrew de bedel dayîn e.

Em wek Heyva Sor A Kûrd, xwedî derketina li van mirovan erkek û deynek yê mirovahîya cîhanê dibînin.

**Pêwîstiyên navendê di hemû beşên wê de di van her du lînkan de hene**

https://docs.google.com/spreadsheets/d/1cwitc1HNzPxArONtd_eWK8UPT4QI2tMF/edit?usp=drive_link&ouid=105915724499878009833&rtpof=true&sd=true

https://docs.google.com/spreadsheets/d/1cwitc1HNzPxArONtd_eWK8UPT4QI2tMF/edit#gid=379162465

Heyva Sor a Kurd

2024 - 04 - 08

**Kurdish Red Crescent, KRC – Heyva Sor A Kurd NGO**
**Headquarters:** Kornish district – Eben Hesham street, building num. 12 Al-Qamishli – Syria
Tell: +963 52 430 700 - email: info@hskurd.org - website: www.hskurd.org